

Înês Hagê Meyer helbestvana elmanî ji dîwana Lepxwandin „Handverlesen“

Serdor

Ji min re bextewerîyek bû van helbestan bixwînîm, wergerînîm, xwîneke kurdanî bi dil û rehên wane elmanî, ispanî, û emêrika latînî re biherkînîm û kûranîya wane fîlosofî û lîrîzmî di wergera kurdî de kûrtir bikim. Eger ev herdu hêman, ango kûranîya lîrîzmî û fîlosofî di berhemekê de amêtebibin, wê demê - li gor raya min - mera bi mesenî û resenîyê re dijî û ji xwe ew jî awata pîroze nivisînê ye.

Husên Hebeş

Leylan (Irreal)

Ez rêya cadûyî
bi wir de bibînîm
bi wê dera ez carekê lê bûm
min telaş li wir derdikir
weha bi lezînî mezin bûm
ew şevpesta pîrhebûkî
ewa di tena min de çal bûbû bavêta
ew girêkîna vekirina
ewên bi kotekî bêdeng kirim
û kanîbama bipeyivîma.

Bîranîn
(Rückblende)

Dudilîya rehkatanê
bergirîya şikestî
hîn kuda
ji bûyerên rojanî
berv sîya dirêje
efsaneyan
te di ziqif de têvedidin
kî yê bê arîyê
di dema çelqîna niskoyê de
ku dikevî navbera derî
û mendel

Kes jê dernekt
(kein Entkommen)

Dema peydabûnê ji rehan
nêzîk dibe
xewneke goştinî
li penayekê digere
tenê ger ne tarî be
lê figûrên kevn
ji seqerê ditirsin
xwe li benan girêdidin
li serbana xemilî
wê bêne mehfirin
bi danganîya peyvan

Cî
(Ort)

Li ew cîyê te
li şûna xwe hêştî
bigermî
li derîyê kevn digerî
li pêş avahîya jihevdikeye
û rengê şînî nîvhindayî
ma darcewên pîr
li çarşîyê xwe bi ser
kevîyên xwar de xwe çemandine
di bin pelkulîkên tozayî de
li cihên sîdarî
mera yê wan binase
paşê tu piştî xwe didî
bîra veqerê
û di xwe de çaldikî

Istiran bona gîtarê
(Lied für Gitarre)

Helbest çî dibêje
dema bêdeng dimîne
ger temê erd girtibe
yan ronîyek biçiruse

Li aso derdikeve
berêvarî diçe ava
û candide
ta careke din bê vejandin

Helbest çî dibêje
dema bêdeng dimîne
bêdengîya mexmelî
û rengînî dipeyive

Helbest çî dibêje
dema bêdeng dimîne
aramîyê li xwe dipêçe
bê ku lalbibe

Istiran bona Medrîdê*

Li daristana mine kevirî
çîmen limanî ye
û esman ewrekî arî ye

Li daristana mine kevirî
dar nîvpeykerekî mermerî ye
rûberine ronahî ne

Li daristana mine kevirî
gazîya revandî
nîvpeyker direwşîne

Li daristana mine kevirî
ne dilop tîn
û ne kulîk zîldide

Li daristana mine kevirî
xewna tacînî
pela hilqetandî ye

Li daristana mine kevirî
leylana şevnimî
sirweyî diherike

Pêstê min istiraneke hildigire

- Vêrsîyona ispanî di „Hêminêya Jînbar“ de, r. 42 belavbûye.
- Ev ergera bi elfabeya erebî di kovara „Raman“, hej. 231, 05.8.216, r. 10 – 11 de belavbûye, bi elfabeya latînî cara yekê di www.dr.habasch.wordpress.com û di facebook de belavbûye

Kurte pênasî

Di civîneke Yekîtiya Nivîsevanên Elman de li Bonnê, sala 2005an min Ines Hagemeyer naskir. Rojgarên me ji hev nêzîkên ji aliyê bobelat, koçberî, sitemî û wêjeyî. Dema minhoya paxşanî dawyê ya Federico Garcia Lorca (1898 – 1936) „Keviran davêjin esmên“ sala 1998an hate dîtin I. Hagemeyer ew wergerand elmanî û min jî bi kurdî di kovara „Pênûsê“ de belavkir.

I. Hagê Meyer sala 1938an li Berlinê hatîye dinê, her di wê salê de jî li gel malbatê neçarbûne Elmanîya bicihbêlin û li Uruguayê, li bajarê Montevideo mezinbibe û bi sê zimanan, elmanî, ispanî û inglîzî perwerdebibe. Nivîsevanê li Uruguay û Elmanîya xwandîye, wek mamosteya zimanê elmanî li Goethe Institut li pir welatên spanîaxêv xebitîye. Ew cara yekê sala 1963an vedigere Elmanîya (München), cara dudîyê sala 1969an li Bonnê cîwardibe. Ji sala 1981ê de hevkarê rêdeksiyona kovara wêjeyî „Dichtungring“ e.

Roja 25.5.2016 li Bonnê, helbestvanê ji berevoka xweye nû Lepxwandin „Handverlesen“ (Pop Verlag, 2015) helbestin pêşkêşî guhdaran kirin.

Piştî guhdariya xwandinê, min jê xwest, ku rê bide çend helbestên wê wergerînim kurdî, wê jî bi kêfxweşî erêkir.

Bonn, 15. 6. 2016